

Mahîr ÇAYAN: JI ASD'YÊ RE NAMEYA VEKIRÎ (*)

MAHIR ÇAYAN

JI ASD'YÊ RE NAMEYA VEKIRÎ (*)

Di van rojan de di derbarê veqetîna me ya ji ASD'yê de hin gotin û gotegot derketine; ji ber vê yekê jî em pêwîst dibînin ku vê daxuyaniya nivîskî biweşînin.

Di vê nivîsa kurt de em ê bi kurtasî behsa wê yekê bikin ku em çima ji kovarê veqetiyane û cudahiyên me yên nêrînê çî ne. Her wiha em ê bi awayekî berfireh nêrînên xwe yên di derbarê hin mijarên tevgera şoreşger a Tirkiyeyê de (bi gelemperî riya şoreşê, nakokî û têkiliyên çînî yên Tirkiyeyê, nirxandina dîroka tevgera çepgir û riya li gorî Tirkiyeyê û hwd.) derxin holê.

-I-

Di van rojan de çînên serdest di nava hewldanan de ne ku hin mafên sînardarkirî yên demokratîk jî ji holê rakin û ji bo ku tevgera şoreşger a proleter têk bibin, dikevin nava hin leyîstokan. Di rojên wiha de ne xweş e ku di nava refên me de parçebûn çê bibe. Û aşkere ye ku gelek hevalên ku ji tevgera me hez dikin, lê belê rewşa rastîn nizanin jî wê ji ber vê veqetandinê adiz bibin.

Bi rastî jî em nikarin bêjin ku parçebûn rast e. Lê belê li gel hemû hewldanên me jî me nikarîbû em di nava Kovara Aydinlik Sosyalist de "riya yekîtî-rexne-yekîtî"yê bi kar bînin û bîrdoziya rastgir ji vir derxînin. Di nava Kovara Aydinlik Sosyalist de ew derfet tune ne ku bîrdoziya rastgir, bi riya nîqaşê were dîrxistin û çê nabe ku di navbera herdu bîrdoziyan de hevsengiyek were avakirin. Ji ber vê yekê jî veqetandin pêwîst bû. Di wateya rastîn de yekîtî, incex li ser

bingeha sosyalîzma zanistiyê tê avakirin. Yekitî, nayê wateya kombûna li derdora kesayetan. Yekitiya tevgerê, yekitiya li ser *hêmanên lenînîzmê* ye. Û ji ber vê rewşê jî me dev ji Kovara Aydinlik Sosyalist qerîya. (1) Bila neyê jibîrkirin ku tiştên ku ji bo îro ne baş bin, dibe ku ji bo siberojê baş be. Û îro ev yekitiya ku em hewl didin li ser bingeha *hêmanên şoreşger* ava bikin, di wê hêzê de ye ku xemgînî û tirsên heyî, veguherîne kêfxweşiyê.

-II-

Riya şoreşê çalûxwar e, çivanek e û asê ye. Mijarên tevgera şoreşger, mijarin tevlihev in û çareserîya wan zehmet e. Di nava van şert û mercan de, ji ber xerabûnên bergehê çînên civakî, dibe ku di nava tevgerê şoreşger de baskên çepgir û rastgir derkevin ku bi awayên cuda *hêmanên tevgerê nîqaş* bikin û "*nêrînên cuda*" derkevin. Di vir de ya girîng ew e ku em bi daxwaza yekitiyê derkevin rê; li dijî hev rêzdar bin; dakevin bingeha cudahiya *nêrînan*; bi *hêmanên şoreşger ên sosyalîzma zanistiyê* van cudahiyan ji holê rakin û yekitiyê ava bikin.

Helwesta şoreşger ev e. Ango li hemberî cudahiyên *nêrînan*, helwesta şoreşger ne ew e ku weke ku hinek heval dikin, mirov van cudahiyan veşêre. Pêwîst e mirov bi ser van cudahiyan de biçe.

Em hertim riya duyemîn hildibijêrin. Em li dijî qêrînên sexte yên yekitiyê derdikevin û bi ser cudahiyên bîrdoziyê de diçin. Ev ne helwesteke cudaxwaziyê ye; em bi helwesteke yekitiyê tevgeriyan û bi hêmana "yekitî-rexne-yekitî"yê ve girêdayî man.

Ji destpêkê ve di navbera me û heval Mihrî Bellî de cudahiyên *nêrînê hebûn*. Lê belê me pêşeroj û serboriyên hevalê Mihrî Bellî li ber çavan digirt û ligel ku hin helwest û tevgerên wî yên kesane yên li dijî şoreşgeriya proleteriyayê hebûn jî, me hewl da em yekitiya tevgerê biparêzin. Dema me ev kir jî em neketin nava helwestekê ku tenê roja xwe derbas bikin. Em ji

hêmanên xwe yên ku em ji wan bawer in tu carî dûr neketin. Me hertim û li her derê nêrînên xwe bi awayekî aşkere anîn ziman û nivîsîn. Ji ber ku helwesta yekitiyê nayê wateya hevsengiya bi hêmanên şaş re.

Li hemberî vê helwesta me, Mihrî Bellî û hevalên ku niha li dora wî ne çi kirin?

Hevalê Mihrî Bellî digot ku di navbera nêrînên me de cudahiyên girîng tune ne û wiha nîşan dida ku nêrînên xwe yên di derbarê mijarên weke neteweperestî, revîzyonîzm û rêxistinê de wê hin nêrînên xwe biguherîne. Bi vî awayî nêrînên rastgir ên di nava refên me de, bi saya mekanîzmaya rexneyê ya ku ji hêla vî hevalî ve dihate meşandin, bêbandor dibûn. Lê belê bûyerên paşê, hêviyên me vala derxistin. Civîna di 29-30'ê Cothmehê de da xuyakirin hevalê M. Bellî di vê helwesta xwe de ne jidil e. Hevalê Mihrî Bellî di vê civînê de bi helwesteke cudaxwaz û parçeker, ew nêrînên xwe yên kevn ên rastgir careke din anîn ziman û got ku nêrînên ku li dijî nêrînên wî ne, nêrînên bi giştî şaş in. Her wiha got "hêmanên me, hêmanên min in; kesên ku li pey min werin bila bînin; kesên nayên jî bila neyên" û bi vî awayî pê li hêmana "yekitî-rexne-yekitî"yê kir.

Şaşitiyên ku têne kirin, bi riyên çewt nayên sererastkirin. Her wiha mirov ser wan bigire jî nêrînên şaş ji holê ranabin. Hin mirov hene ku her rexneyê, weke kîneke li hemberî xwe dinirxînin. Ev nerazîbûna wan nîşan dide ku di binê "cudahiyên biçûk ên nêrînê" de cudahiyeke mezin a bîrdoziyê heye. Hişyariyên *cidî* yên ji bo sererastkirina van xeletiyên û nêrînên rastgir jî bi van kesan re wê hestê ava dike ku dema parçekirina hertiştî hatiye. Û pirsgirêk jî weke civîna di 29-30'ê Cotmehê de, di demeke ku nedihat payîn de derdikeve holê.

Di vê civînê de *baskê rastgir* ê Kovara Aydinlik Sosyalist, nêrînên xwe weke nêrînên Kovara Aydinlik Sosyalist ragihandin.

Di nava rewşeke wiha de gelo ji bo tevger parçe nebe me yê

çavê xwe ji binpêkirina hêmanên şoreşger ên proleteriyayê û xistina ala lenînîzmê ya nava çirava oportunîzmê re girtiba?

Na, hezar carî na!

*“Em teqez ne amûrê aştî û yekitiyê ne; em neçar in ku tu carî cudahiya nêrînan veneşêrin û wan bi awayekî zelal derxin holê. Em teqez ne cudaxwaz û tevlihevker in jî. Heger ji bo sererastkirina jirêderketinan hemû derfet tune bibin, em **nelihevkerên herî mezin ên cîhanê** ne.*

Ji bo me veqetandin kengî dibe drûşm? Heger tevlihevî, ji bo pêşketina teorîk û pratîk bibe asteng...” (Lenîn, Komunîzma Çepgir).

Êdî ji ber ramanên rastgir ên Mihrî Bellî, di nava tevgerê de tevliheviyek serdest e. Ev tevlihevî, êdî li hemberî pêşketina teorîk û pratîk a tevgerê dibe asteng.

Êdî veqetandin drûşmeya me ye.

Û weke şoreşgerên xwedî şeref û namûsa şoreşgeriyê yên ku hêmanên şoreşgeriya proleteriyayê bi ser hertiştî digirin, me hemû girêdanên xwe yên bi Mihrî Bellî û tevgera ku ew nûnertiya wê dike re qut kirin!

-III-

Hin hevalên ku heta doh jî weke me difikirin, li cem vê ramana rastgir man.

Riya şoreşê çalûxwar e, çivanek e û asê ye. Hin kes dikevin û li paş dimînin. Hin hevalên ku heta doh jî milbimil bi me re dimeşyan, niha ne bi me re ne. Me nikarîbû em ji bo xatirê wan hinekî din jî bimînin. Ji ber ku wan jî paşketin hilbijart. Wan çirav hilbijart. Û mixabin berê lûleyên çekên xwe dan me. Ev têkoşîn, têkoşîna çînan e. Di vir de cihê ricifandina dest tune ye; cihê dudilî û bêbiryarbûnê tune ye. Di têkoşîna çînayetiye de, li derveyî hevrêtiya proleteriyayê, cihê têkiliyên feodal û bavixsalarîyê tune ye.

Ya êşdar ew e ku wê ev hevalên me wê xwe ji hevalên xwe yên ku heta doh bi hev re bûn, adiz bikin û gazincan ji wan bikin. Û dema vê yekê dikin jî wê bêjin ku ew jidil vê yekê dikin. Jixwe niha jî ev heval dibêjin ku ji bo parastina aramiya tevgerê ew di nava wan refan de dimînin; cudahiyên nêrînan ne di wê astê de ne ku bibin sedema veqetînê; tenê “cudahiyên biçûk ên nêrînê” hene. Li gorî wan, em kesên tund in ku tiştên biçûk mezin dikin; dibêjin ku di vê demê de MÎT, CIA û hemû baskên oportunîzmê êrîşî M. Bellî dikin; di demeke wiha de ne rast e ku M. Bellî were rexnekirin. Me bi wê yekê tawanbar dikin ku me berê tiştê digot, lê niha em tiştê din dibêjin û em niha hatine guhertin.

Helwesta van hevalan a kesane çiqasî baş û “şoreşger” be jî, tiştên ku dibêjin demogojî û gotinên çewt in.

Ji ber ku wê bi van gotinên çewt serê hinek hevalan tevlihev bibe, em ê yek bi yek bersiva wan bidin.

Hûn jî dizanin ku cudahiyên di navbera nêrîna me û nêrîna ku hevalê Mîhrî Bellî nûnertiya wê dike de, ne “cudahiyên biçûk ên nêrînê” ne.

Ma ne we jî digot ku sedema rexneyên li ser Kovara AYDINLIK Sosyalîst û sedema belavbûna zêde ya di nava refên me de, ew *nivîsên* hevalê Mîhrî Bellî ye ku tê de nêrînên xwe yên çewt û şêlû tîne ziman?

Gelo cudahiyên di navbera bîrdoziya şoreşger û bîrdoziya rsatgir a ku di warê teorîk û pratîk de pêşketina refên me asteng dikin de, “cudahiyên biçûk ên nêrînê” ne?

Em bînni bîra van hevalan ku biçûkdîtina oportunîzmê, wê li ser piyan dihêle. Heger mijar weke “cudahiyên biçûk ên nêrînê” biçûk were dîtin, wê encam ev be!

Em *bihesibînin* ku cudahiyên bîrdoziyê yên di navbera me û hevalê Mîhrî Bellî de “cudahiyên biçûk ên nêrînê” ne. Lê belê piştî helwesta takekes û *israra* di nêrîna rastgir de ya hevalê

Mihrî Bellî ya di civîna 29-30'ê, heger hinek bêjin "cudahiyên nêrînan ne girîng in" û mijarê biçûk bikin, wê ev nebe tevgereke şoreşger.

Bila neyê jibîrkirin ku heger di nava tevgerekê de hin cudahiyên şêwazê û nakokiyên lihevker bi hêmana "yekitî-rexneyekitî"yê neyên çareserkirin û xwediyên ramanên çewt, di çewtiyên xwe de *israr* bikin, wê ew nakokî veguherin dijberiyên nelihevker. Veguherîna "cudahiyên biçûk" a bi vî awayî nîşan dide ku di bingehê de cudahiyên bîrdoziyê hene.

Di vê mijarê de Lenîn wiha dibêje: *"her veqetandineke biçûk, heger ISRAR li ser wê hebe, heger hertim di rojevê de were hiştin û heger herkes bi dûv lêkolînkirina reh û şaxikên wê bikeve, dikare veguhere veqetandineke mezin. Heger her **cudahiyên biçûk**, bibin **xala** destpêkê ya ber bi nêrînên şaş ve û ev nêrînên şaş, ji hêla cudahiyên nû ve bi tevgerên **anarşîst** ên ku Partiyê (refên me) digihêjînin asta parçebûnê re bibin yek, wê çaxê ev cudahiyên biçûk **gelekî girîng dibin.**" (Lenîn, Gaveke Ber Bi pêş Ve, Du Gavan Ber Bi Paş Ve, rpl:66)*

Weke ku tê dîtin, mijar aşkere û hêsan e. Bila ev heval heta ku bixwazin bêjin "li dora cudahiyên nêrînê yên bûrjûwaziya biçûk fermanê radikî; cudahiyên mezin ên nêrînê tune ne" û bicihbûna xwe ya li cem hevalê Mihrî Bellî, ji bo aramiya(!) tevgerê weke nermbûna taktîkê nîşan bidin; ji ber ku ji belavbûna nêrînên çewt û rastgir re dibin bingeh û ev helwesta wan ne helwesteke şoreşger e, wê nikaribin ve yekê li pey hincetan veşêrin. Ev hincetên wan gotinên vala ne û demogojî ne!

Em niha behsa demogojîya hevrebûna bi CIA, MÎT, TÎP û PDA'yê re bikin...

Li gorî van hevalan pêwîst e ku rexenyên me sînordarkirî bin. Bi taybetî jî di vê demê de şaş e ku mirov hevalê Mihrî Bellî bike armanc. Ji ber ku CIA jî, MÎT jî, Radyoya Bizim'ê jî, PDA jî û TÎP jî êrîşî hevalê Mihrî Bellî dîkin. Heger mirov di vê

demê de hevalê Mihrî Bellî rexne bike, ev tê wê wateyê ku mirov bi van dezgehên re di heman maqamî de stranên dibêje û dikeve nava leyîstoka emperyalîzm û oportunîzmê.

Ev, gotineke bêbingeh e û demogojîyeke mezin e.

Em dixwazin ji van hevalan bipirsin; gela Hikmet Kivîlcimli'yê ku di derbarê nêrînên rastgir ên M. Bellî de hin pirtûk derxistin û nûnerê "herî kevn ê sosyalîzmê" ye, piştî temenê xwe yê 70'yî ji rê derketîye û ketîye nava leyîstoka CIA'yê?

Wekî din, gelo çima hevalê Mihrî Bellî ewqasî dibe armanca emperyalîzm û oportunîzmê? Hevalê Hikmet Kivîlcimli di heyama 1951-1960'î de ku tê de "tîfîngên kevn" nediteqîyan de di nava şert û mercên dijwar de têkoşîneke xurt meşand û di derbarê têkilî û nakokiyên çînen Tirkîyeyê de gelek xebatên giranbûyên teorîk meşandin. Gelo çima ev heval, wekî hevalê Mihrî Bellî hertim nabe armanca CIA, MÎT û oportunîzmên PDA û TÎP'ê?

Gelo van hevalan li ser vê yekê fikirîne? Gelo CIA, MÎT an jî her cûreyên oportunîzmê, hevalên din ên şoreşger ên proleterayê weke xetereyekê nabînin? Bêguman ne wiha ye.

Du sedemên sereke hene ku hevalê Mihrî Bellî rastî ewqasî êrîşan tê. Sedema yekemîn ew e ku ev heval heta niha wekî berdevkê tevgera me tê dîtin. Di vir de ne ku taybetmendiyên mezin ên hevalê Mihrî Bellî dibin armanc; tiştê ku dibe armanc, tevgera me ya proleter û şoreşger e ku ji 30'î zêdetir şehîd dane, hewl dide tevgerên karker û gundiyan ên Tirkîyeyê bi rêve bibe û bi riya *Dev-Genç*'ê, serkêşîya tevgerên ciwanên dij-emperyalîst kiriye. Bêguman di vê rewşê de ne Mihrî Bellî, kî dibe bila bibe wê bi qasî Mihrî Bellî bûbaya armanc.

Sedema duyemîn jî ew e ku tevgera me hewl dide li dijî emperyalîzmê û hevkarên wê yên herêmî, têkoşîna herî bi biryar û nelihevker bide meşandin û bi piranî ji endamên şoreşger ên ciwan ên proleter pêk tê. Ligel hemû nêrînên xwe yên rastgir û xeta xwe ya xwar jî hevalê Mihrî Bellî dixwaze berdevkiya vê tevgerê bike û dike jî. Di êrîşên rexneyî yên oportunîzmê de

para van nêrînên nehevgirtî yên Mihrî Bellî jî heye. Oportunîzm, rastiyên himberî xwe jî berovajî dike. Û heger li himberî xwe ewqasî şaşitiyan bibîne wê çi neke?

Niha em ji van hevalan dipirsin; heger serkêşiya tevgerekê wiha be wê pêngavên rast pêk werin?

Endamên wê çiqasî hevgirtî bin jî heger serokê orkestrayê ewqasî ne hevgirtî be wê ew orkestra bi ser bikeve?

Kesekî ku di cihekî girîng de ye, ne pêwîst e xwedî xetêke rast û hevgirtî be?

Di nava van mercan de heger em bêjin CIA, MÎT û oportunîzm êrîşî hevalê Mihrî Bellî dike û em tevgerê radestî bîrdoziya şaş û rastgir a hevalê Mihrî Bellî bikin, wê ev rast be? Gelo ne çêtir e ku em vê bîrdoziyê rexne bikin û ji holê rakin?

Gelo arteşeke ku ji hêla dijmin ve hatiye dorpêçkirin û ji çar aliyan ve rastî êrîşan tê, pêwîst e serkêşiya şaş biopîne yan ji bo ku bergeh rast bibe, heta dawî têbikoşe?

Li gorî me riya duyemîn rast e. Ji ber sosyalîzma zanistiyê, vê yekê dixwaze.

Niha em behsa wê yekê bikin ku qaşo me nêrînên xwe guherandine...

Ev hevalên me ji bo ku lihevkerinên xwe û nêrînên rastgir ên Mihrî Bellî rewa nîşan bidin, dibêjin ku me doh tiştêkî digot û îro em tiştêkî din dibêjin.

Ev gotinên wan jî weke gotinên wan ên din vala û bêbingeh in û lewra jî demogojîyeke şaş e.

Nivîsên me û axaftinên me yên di civînan de li holê ne û zelal in. Û axaftin û nivîsên hevalê Mihrî Bellî jî li holê ne.

Mixabin ên ku hatine guhertin hûn in hevalno!

Bi awayekî zelal tê dîtin ku we qaşo bi *"hin rexneyan"* re xeta

Mihrî Bellî pejirand û we helwesta xwe guhert!

Em niha behsa tawanbariyên hişkbûn, veşartîbûn û parçebûnê bikin... Di destpêkê de em dixwazin ji van hevalên dibêjin ku em hişk n re bipirsin:

Gelo polîtîkaya rast ew e ku mirov bêje ramanên rastgir ên Mihrî Bellî şaş in, lê mirov li dijî wê yekê derkeve ku ev bîrdozî ji nava refên me were dûrxistin?

Şaşitiya nêrînên rastgir ên Mihrî Bellî dipejirînin, lê belê weke nêrînên ASD'yê nîşan didin. Gelo ev ne xapandina milîtanên tevgera me ye?

Bêguman heger em di riya van hevalan de meşiyabana wê nêrînên şaş ên hevalê Mihrî Bellî di nava refên me de xurttir bûbana û gelek hevalên me yên ku di hêla teorîk de ne ewqasî xurt in wê di binê bandora van nerînan de riya xwe şaş bikirana. Di vê rewşê de wê tevgera me ya proleter a şoreşger lawaz bûba û oportunîzm jî wê xurt bûba.

Gelo mirov li dijî bîrdoziyê rastgir ne çalak be ev nayê wê wateyê ku mirov di eniya alîgirên wê bîrdoziyê de ne?

Li hemberî nêrînên oportunist helwesta şoreşger, helwesta nelihevker e. Kesên ku li dijî nêrînên oportunist ne hişk bin, wê li dijî gelê xwe yê kedkar hişk bin.

Heger ala lenînîzmê dakeve nêvî, tevgera şoreşger lawaz dibe û dijmin xurt dibe. Heger ala bîrdoziya şoreşger were hildan, şoreş bilind dibe û dijmin derbên giran dixwe.

Em bi bîrdoziya rastgir re li hev nakin û em hewl didin ala bîrdoziya şoreşger li jor bihêlin. Helwesta rast ew e. Em di vê helwesta rast de heta dawî li ber we didin û em ê li ber xwe bidin. Ji ber ku em teqez jê bawer in ku incex bi vî awayî refên me dikarin xurt bibin û incex bi vê biryardariyê tevgera me dikare pêngavan bike. Hûn çawa dikarin ji vê re bêjin helwesteke hişk?

Her wiha dibêjin ku heger mirov li dijî Mîhrî Bellî derkeve, ev tê wê wateyê ku li dijî dîroka tevgerê derdikeve. Ev jî demogojî ye... Hinek heval şîroveyên şaş dikin û dibêjin ku Mîhrî Bellî nûnertiya dîroka tevgerê dike û heger mirov li dijî nêrînên wî yê rastgir derkevin, ev tê wê wateyê ku li dijî pêşeroja şoreşger a tevgerê derdikevin. Her wiha dibêjin ku ew jî li dijî nêrînên Mîhrî Bellî ne, lê belê ji bo ku grêdanên xwe yê bi pêşerojê ve qut nekin, ew çavên xwe digirin û lewra jî pê re tevdigerin.

Ev helwest e jî tewş e, bêbingeh e û ne şoreşgerî ye. Ev têkilî, ne têkiliyên sosyalîst in; ne şoreşger in; ne asayî ne û têkiliyên feodal in.

Hin kes têkiliyên di navbera marksîstan de weke têkiliyên malbateke feodal fêm dikin û mîrateya dîrokê ya vê tevgerê jî weke veguhestinên ji malbata feodal re dinirxînin. Ji bo kesên wiha qutbûna me ya ji nêrînên rastgir ên Mîhrî Bellî û xeta ku ew nûnertiya wê dike, dibe ku were wateya qutbûna ji girêdanên dîrokê.

Lê gelo têkiliyên di navbera sosyalîstan de wiha ne? Ne, wiha nabe.

Li Tirkiyeyê dîroka tevgera marksîst, dîrokeke bi rûmet e. Di salên tarî yê rêveberiyên CHP û DP'yê de şoreşgerên Tirkiyeyê yê proleter, bi wêrekî û lehengî têkoşîna xwe meşandine. Di nava tevgera şoreşger a proleter a Tirkiyeyê de hevalên me yê ku li dijî reva siyasî têkoşîneke bêhempa meşandine, ji bo şoreşgerên ciwan ên proleter, bûne mînak û xwedî nirxeke mezin. Lê ev nayê wê wateyê ku em şaşitiyên berê rexne nekin. Polîtîkaya rast a îro û sibe, li ser rexnekirina tiştên berê bilind dibe.

Em li himberî dîroka tevgera marksîst a Tirkiyeyê heta dawî rêzdar in. Û em xwe weke berdewama wê dibînin.

Em li dijî wê nêrînê ne ku dibêje “ez dîrok im; kesên ku li dijî min derdikevin, li dijî dîrokê derdikevin”. Û em bi

xwedyê vê nêrînê re têkiliyên xwe qut dikin, ne bi dîrokê re!

Gotina ku dibêje “em kevn in, em dizanin”, gotineke çewt e. Hûn çî dizanin? Heger em bi rastî jî şoreşger bin, em dizanin. Têkiliyên di navbera sosyalîstan ne têkiliyên baregeha leşkerî ne. Mejiyê kesên ku dibêjin qey bi salê re payeya wan bilind dibe û li bendê ne ku kesên din bi ya wan bikin ne sosyalîst e, lê belê tenê mejiyê leşkerî ye.

Di tevgera sosyalîst de bêguman li hemberî kesên ku berê têkoşiyane rêzdarî heye û ew li pêş in. Di nava tevgera sosyalîst de bêguman hiyerarşî heye. Lê hiyerarşiyê çawa? Hiyerarşiyê li ser bingeha bîrdoziya rast. Bi qasî ku mirov berdevkiya gotinên rast bikin, girse wan nas dikin; heger mirov li ser nêrînên xwe yên şaş bimînin, êdî li holê hiyerarşî namîne!

Her wiha kesek radibe û dibêje ez dîroka tevgera şoreşger im. Li kîjan welatê cîhanê tiştêkî wiha hatiye dîtin?

Gelo ev nayê wê wateyê ku li welatê me dîroka tevgera şoreşger lawaz e?

Gelo ev nabe biçûkdîtina dîroka tevgera şoreşger a li welatê me?

Kesên ku dixwazin mîrateya pêşerojê werbigirin û bibin nûnerên têkoşînên biryardar û nelihevker ên pêşerojê, pêwîst e ku ala şoreşa proleteriyê li jor bigirin.

Kesên ku vê alê li jor nagirin û dibin sedem ku tevger bibe armanca oportunîzmê û tevgerê lawaz dikin, pêşeroja wan çî dibe bila bibe, nikarin bêjin em nûnerên pêşerojê ne.

Îro kî ala pîroz a lenînîzmê di teorî û pratîkê de li dijî emperyalîzm û oportunîzmê bilind bikin, ew li Tirkiyeyê dibin xelekeke ji zincîra dîroka tevgera marksîst û berdewama wê!

Bi kurtasî em bi wê yekê têne tawanbarkirin ku em li dora “cudahiyên biçûk ên nêrînê” tiştên biçûk mezin dikin. Çima? Ji

ber ku ji dêvla perspektîfa Marksîzm-Lenînîzmê, me perspektîfa hevalê Mihrî Bellî nepejirandiye!

Em bi wê yekê têne tawanbarkirin em bi emperyalîzm û oportunîzmê re di heman meqamî de stranan dibêjin. Çima? Ji ber ku em li dijî bîrdoziya rastgir derdikevin ku pêşketina tevgera me asteng dike!

Em bi wê yekê têne tawanbarkirin ku me girêdana xwe ya bi dîrokê re qut kiriye. Çima? Ji ber ku me çavê xwe ji daxistina ala Marksîzm-Lenînîzmê re negirtiye û me ne li paş xwe lê belê li pêşiya xwe neriye!

Em bi hişkbûn, veşartîbûn û parçekeriyê têne tawanbarkirin. Çima? Ji ber ku em li dijî bîrdoziya rastgir hişk in; em bi wê re li hev nakin û em nakevin nava koma hevaltiya têkiliyên feodal!

Bila em bibin armanca van. Em ê heta dawî di riya ku em jê bawer in de bimeşin. Di vê riyê de em ê rastî tawanbariyan, bêbextiyan, gotinan nebaş û heta *provokasyonan* werin. Gelo li cîhanê tevegrike marksîst-lenînîst heye ku ji hêla oportunîzmê ve rastî tawanbariyên wiha nehatibe? Her wiha gelo mînakek heye ku oportunîzmê bi van tawanbariyan zora tevegrike marksîst-lenînîst biriye? Na, na hevalno! Li tevahiya cîhanê tevgera marksîst li dijî tawanbarî, bêbextî û provokasyonên oportunîzmê û li dijî hemû pêkutî û tundiyên dermirovî yên emperyalîzmê û çînên serdest hertim bi hêz bûye, xurt bûye û gihaye serkeftinê!

Helwesta me, helwesteke şoreşgeriya proleterayê ye. Ji ber ku peywira herî pîroz a şoreşgerên proleter ew e ku bi hêmanên şoreşa proleterayê ve girêdayî bimînin û li dijî hin nêrînên "çepgir" û rastgir û tevgerên ku hewl didin van hêman bin pê bikin, di nava têkoşîneke nelihevker de bin!

-IV-

Em niha behsa cudahiyên bîrdoziyê yên di navbera me û hevalê

Mihrî Bellî de bikin. Em dikarin van cudahiyên bîrdoziyê di binê sê sernivîsên sereke de kom bikin:

1- *Hişmendiya şoreşê*

2- *Şêwaza xebatê*

3- *Hişmendiya rêxistinbûnê*

Cudahiyên nêrînê yên di mijarên weke netewperestî û revîzyonîzmê jî tenê şaxikên van hersê mijarên sereke ne.

HIŞMENDIYA ŞOREŞÊ

Dîroka şoreşê nîşan dide ku di navbera marksîzm û oportunîzm û reformîzma hemdem de cudahiya nêrînê, hebûn û nebûna “ji bo şoreşê baweriya ji hêza xwe û wêrekiya derketina rê” ye. Di bingeha cudahiyên hêmanan ên teoriya şoreşê, şêwaza xebatê û rêxistinbûnê de, ev rastî heye.

Îro li welatên mêtîngeh û nîv-mêtîngeh, têkoşîna bîrdoziyê ya di tevgera çepgir de, li dora du nêrînan pêk tê; nêrînek dibêje ku pêwîst e ji gundewaran, bajar werin dorpêçkirin û artêşa gundiyan, bi pêşengiya çîna karkeran, bi şerekî gel ê demdirêj bigihêje serkeftinê û nêrîneke din jî dibêje ku pêwîst e ku li bajaran, di nava sînorên ku ji hêla dijmin ve hatine diyarkirin de ji bo “zagonsaziyê” têkoşîn were meşandin û pêwîst e mirov xwe bi hêzên derveyî hêza xwe ya cewherî ve girê bidin.

Li gorî teoriya Lenîn, li welatên nîv-mêtîngeh û mêtîngeh, pêwîst e bi pêşengiya çîna karkeran, artêşa gundiyan were avakirin û bi şerê gel re, ji gundewaran, bajar werin dorpêçkirin.

Em napejirînin ku welat, parzemîn an jî herêmên mêtîngeh û nîv-mêtîngeh xwedî taybetmendiyan xweser in ku vê hêmana gerdûnî ya lenînîzmê ji meriyetê rakin.

Taybetmendiyan dîrokî û herêmî, çandên herêmî û asta geşedanê

ya hêzên hilberînê, tenê bergehê taktîkî ya vê stratejiya şoreşê ya gerdûnî ya lenînîzmê diyar dikin. Ev cudahî, dikin ku merhaleyên navberê yên stratejiya şoreşê yên wî welatî cuda bin.

Li welatên mêtîngeh û nîv-mêtîngeh, di eniya çepgir de bingeha cudahiyên bîrdoziyê ev e. Navlêkirinên weke “Kastrîst”, “Maoîst” û “Guevarîst” jî di cewhera xwe de tu wateyê nadin. Drûşmeyên wan çî dibin bila bibin, dibe ku partî û tevgerên ku navên “Kastrîst” û “Maoîst” li xwe dikin, di nava gotinên vala yên çepgiriya de bin. Li cîhanê û li welatê me mînakên vê yekê hene. (2)

Em dibêjin ku wê şoreş li ser bingeha hevbendiya karker û gundiyan, ji gundewarên ku tê de nîrên emperyalîzmê lawaz in dest pê bike û paşê bajar werin bidestxistin. Di vê nêrînê de gundî, hêza sereke ne, proleterya jî hêza pêşeng e. (3) Pêşengiya proleteriyayê, pêşengiya bîrdoziyê ye.

Hevalê Mîhrî Bellî jî pêşengiya çîna karkeran napejirîne; gundiyan weke hêza sereke nabîne; çîna karkeran weke hêza sereke dipejirîne û dibêje ku pêşengiya çalak a çîna karkeran heye.

Aşkere ye ku weke qada sereke ya şoreşê bajar an jî gundewar werin hilbijartin, li gorî wê jî ast û pêşengiya çînan tê diyarkirin. Nêrîna ku çîna karkeran weke hêza sereke dibîne û pêşengiya bîrdoziyê napejirîne, di gotinê de çî bêje jî, bajaran weke bingeha têkoşînê dinirxîne. Û li gorî vê hişmendiya wê şoreş ji bajaran ber bi gundewaran ve biçe.

Ev hişmendî, ji bingeha xwe de şaş e. Heger hinek bêjin ku bêyî şereke demdirêj û tevlihev a artêşa gundiyan li welatekî ku di binê nîrê emperyalîzmê de ye wê şoreş pêk were, wê ew kes di nava xeyalên vala de bin. Sosyalîzma zanistiyê û pratîka şoreşa cîhanê jî dibêjin ku ev hişmendî, tenê xeyalek e. Nîrê emperyalîzmê bi vî awayî nayê şandin. Pêwîst e ku ji xelesa herî lawaz, zincîra emperyalîzmê were şandin. (4)

Reformîzma hemdem, weke hêza sereke ya şoreşê, çîna karkeran dipejirîne û teoriya şoreşê ya ji gundewaran ber bi bajaran ve jî weke “çetetiya gundiyan” bi nav dike û weke tevgera bûrjûwaziya biçûk şermazar dike. Nakokiya di navbera vê nêrîna Mihrî Bellî û ramanên me de, cudahiya di navbera reformîzma hemdem û lenînîzmê, cudahiya bîrdoziyê ya di navbera partiyên çepgir ên klasîk û partiyên lenînîst de ye.

Hişmendiya şoreşê ya hevalê Mihrî Bellî, çiqasî xwedî niyeteke şoreşger be jî, di dawiyê de xwe dispêre reformîzma civakî.

ŞÊWAZA XEBATÊ

Di navbera teoriya şoreşê û xebatên riya şoreşê de hevsengiyêke giştî heye.

Heger li şûna şerekî gel ê demdirêj û tevlihev, weke bingeha şoreşê bidestxistina desthilatdariyê ya çîna karkeran were hilbijartin, di heyama qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê de ji ber venêrîna tund a emperyalîzmê û çînên serdest a li ser bajaran wê hêzên subjektîf ên şoreşê bi awayekî neçar piştî xwe bi hêzên din ve girê bidin. Ango di nava vê hişmendiye de niyeta mirovan a subjektîf çiqasî şoreşger be jî wê hêzên şoreşê baweriya xwe bi hêzên derveyî hêza subjektîf a şoreşê (hêza xweser a rêxistinbûyî) ve bînin û heta wê ji bo demekê pêngava van hêzan ji xwe re bikin bingeh. Xebatên pratîk û nêrînen teorîk ên hevalê Mihrî Bellî aşkere ne. Kovara Turk Solu'yê bi pêşengiya hevalê Mihrî Bellî dixwaze ji bo hemû çalakiyan eniyêke bê proleteriyayê ava bike. Çîrokên weke *Dev-Güç'ê* (Hêza Şoreşger) jî ji hêla herkesî ve tên zanîn.

Nêrînen teorîk ên di vê mijarê de ên Mihrî Bellî jî diyar in. Hevalê Mihrî Bellî heta îro di dahûrandinên xwe de cih nedaye hêza xwe ya cewherîn, lê belê cih daye hêzên rastgir. Di pirtûka xwe ya bi navê “Yazilar” de jî tê dîtin ku serdestiya bûrjûwaziya biçûk û nêrîneke rastgir heye. Di vê nêrîna reformîst de “riya şoreşa neteweyî” heye ku reformîzma hemdem wê bi nav dike. Li gorî vê stratejiya reformîst bêguman mirov

nikare bi ruhekî şoreşger, hêza xwe ya cewherîn bi rêxistin bike û bikeve nava tevgerê.

Bi kurtasî şêwaza xebatê ya hevalê Mihrî Bellî wiha ye. Di civîna 29-30'ê Cotmehê de rêveberekî Turk Solu'yê wiha got: "yekane armanca me ew e ku em kesên ku weke tifingên kevn têne binavkirin, rewa bikin" û bi vî awayî hemû xebata Turk Solu'yê rave kir. Ango Turk Solu, bi rêveberiya Mihrî Bellî tenê dixwaze zagonîbûnê bide Mihrî Bellî û çend "tifingên kevn"! Û îro hîn jî ev "têkoşîna ji bo zagonîbûnê" berdewam dike!

Di navbera şêwaza ku li gorî qedexekirina sosyalîzmê tevdigere, ji xwe re dibêje "neteweperestiya şoreşger", navê xwe vedişêre û armanca wê ya sereke zagonîbûn e û şêwaza xebatê ya şoreşger a proleter de teqez wekhevî tune ye.

HIŞMENDIYA RÊXISTINÊ

Gelekî ji rêzê ye ku şaşitiyên teoriya şoreşê û şêwaza xebatê ya kesan, xwe di hişmendiya rêxistinê de jî bidn der. Heger qada şer şaş were hilbijartin, wê şêwazeke şaş a xebatê derkeve holê; heger şêwaza xebatê şaş be, wê rêxistina ku xebatan bi rêve dibe û di nava xebatên herêman de hevsengiyê ava dike jî şaş û nehevgirtî be. Gelo pêkan e ku femandariya artêşeke ku bergeha wê şaş e, hevgirtî be? Kesên ku bajaran ji xwe re dikin bingeh û "ji bo zagonîbûnê" di nava çarçoveya dijmin de tevdigerin wê xwediye hişmendiyeke rêxistinê ya ne şoreşger bin. Gelo pêkan e ku ji kesekî ku vê şêwaza xebatê ya rastgir û vê teoriya şoreşê hilbijartiyê, xwedî hişmendiyeke rêxistineke şerker be?

Ji ber vê yekê hevale Mihrî Bellî, bi vê teoriya şoreşê û şêwaza xebatê, hişmendiya partiya proleterayê berovajî dike. Hişmendiya partiyê ya vê nêrînê, gotinê wê çiqasî tûj bin jî nikare rêxistina şer ava bike û wê bibe *rêxistina pergalê*.

Oportunîzm, li dijî rêxistinbûna Lenînîst li her derê û hertim du tiştan pêşniyar dike:

1- *Demokratîzm*: Bi awayekî herî demokratîk, rêxistinbûna ji jêr ber bi jor ve.

2- Di merhaleya pêşîn a avakirina partiyê de, sazkirina *zêdebûna*

Di mijara rêxistinê de oportunîzm û menşevîzm, di van herdu xalên sereke de derdikevin holê; di van herdu xalên sereke de diyar dibe ku ew partiya ku nû ava bûye yan jî di merhaleya avabûnê de ye wê bi partiyeke pergale yan jî rêxistineke şer. Tu rêxistin weke rêxistina şer dest bi kar nake. Lê belê taybetmendiya gava pêşîn dide xuyakirin ku ew rêxistin tovên rêxistinbûna şer di nava xwe de dihewîna yan na.

Hîn di merhaleya pêşîn de Mihrî Bellî û kesên derdora wî digotin: “em ê rêxistinê ji jêr ber bi jor ve bi awayekî herî demokratîk ava bikin û wê di destpêkê de hejmara karker û gundiyan zêdetir be” û bi vî awayî aşkere dikirin ku wê partiya wan nebe partiyeke şoreşger û li dijî emperyalîzmê wê nebe rêxistineke şer.

Nêrînên lenînîzmê yên di derbarê rêxistinê de diyar in; lenînîzm, rêxistina demokratîk a ji jêr ber bi jor ve napejirîne. Lenînîzm, ev nêrîna rêxistinbûnê ya Mihrî Bellî, beriya vê bi 65 salan weke oportunîzmê nirxandiye û nepejirandiye. Hosteyê mezin Lenîn, ji bo kesên weke Marktov û Akselrod'ê menşevîk ên ku weke hevalê Mihrî Bellî rêxistinbûna ji jêr ber bi jor ve diparast wiha digot: “*Hêmanên demokrasiya civakî ya oportunist, şewaza rêxistinbûnê ya ji jêr ber bi jor ve dipejirîne. Û ji ber vê yekê jî (bi eşqeke mezin) xweserî û demokrasiya ku digihêje asta anarşîzmê çêtir dibîne. Hêmanên rêxistinbûnê yên demokrasiya civakî ya şoreşger jî riya rêxistinbûna ji jor ber bi jêr ve dişopînin...*” (Gavekê Ber Bi Pêş Ve, Du Gavan Ber Bi Paş Ve, rpl: 232,233)

Bêguman rêxistina ku bi vî awayî ava dibe, ji hêla şoreşgerên proleter ve weke rêxistina pergale tê binavkirin. Û bi rastî jî ev rêxistin, tu carî nikare bibe rêxistina şer.

Her wekî din oportunîzm, di mijara partiyê de ew şertê ku lenînîzm di merhaleya duyemîn de lê digere, di merhaleya yekemîn de digere. Ango di heyama destpêkê, anga heyama avabûnê de weke ku Mihrî Bellî jî dibêje, diyar dikin ku pêwîst e karker û gundî, anga kesên kedkar piraniyê pêk bînin. (Di encama pêşniyara rêxistinbûna ji jêr ber bi jor ve de ev yek pêk tê).

Lê belê li gorî lenînîzmê di heyama destpêkê ya partiyê de cudahiya bingeha kedkarbûnê yan ne kedkarbûnê tune ye. Di encama oportunîzmê de ev cudahî derdikevin pêş. *Di merhaleya pêşîn de ne girîng e ku ji bingeha karkeran an jî rewşenbîran hatibin; ya girîng hevrebûna bi çîna karkeran re ye; ya girîng ew e ku mirov "ne tenê şevên xwe yên vala, lê belê hemû jiyana xwe bide şoreşê"; di asta pêwîst de marksîzmê zanibe; di hêlekê de bibe pirsor û kesên wiha şoreşgerên profesyonel, bingeha rêxistinê ava bikin. Ya girîng ew e ku şoreşgerên profesyonel di rêveberiyê de bin. Û di heyama destpêkê de dendika pola ya bi hejmara kêr, lê xwe disiplîneke hesinî pêwîst e. Û di heyama destpêkê de bingeha çînî ya dendika pola ne girîng e.*

Lê belê ev dendika pola ji hinmerhaleyan derbas dibe û digihêje merhaleya duyemîn. Di merhaleya duyemîn de tevger, têkoşîna girseyan beralî dike û girseyan himbêz dike; di vê merhaleyê de pêwîst e ku kesên kedkar bêtir hebin. Lenîn dibêje ku di heyama destpêkê de cudahiya rewşenbîr û kedkaran, oportunîzm e; lê belê di heyama duyemîn de pêwîst e ku di rêveberiya partiyê de kesên karker bi hejmareke zêde cih bigirin.

Oportunîzm hertim di heyama pêşîn de cudahiya rewşenbîr û karkeran tîne rojevê, dijminahiya rewşenbîran ava dike û weke ku li cem karkeran be xwe nîşan dide. Ev, helwesteke sexte ye. Oportunîzm naxwaze li cem karkeran be yan jî hejmara karkeran zêde be; ew, li gorî xwezaya xwe *rêzistina pergale* ye. Di mijara rêxistinbûnê de ev xal, taybetmendiya gerdûnî ya oportunîzmê ye. Di heyama destpêkê de oportunîzm "li ba"

karkeran e, lê belê di heyamên duyemîn û sêyemîn de berdevkiya rewşenbîrên bûrjûwaziya biçûk dike ku cihê wan di nava rêxistina şer de tune ye. *Di bingeha xwe de ew di heyama destpêkê de ne li ba proleteriyê ne; ew, xewnên bûrjûwaziya pasîfîst a ku nikare li dijî çînên serdest şer bike, ango rêxistinbûna pergale tîne ziman. Vê yekê di binê rûpoşa qaşo şoreşgeriyê de pêk tîne.* Oportunîzm, di merhaleyên duyemîn û sêyemîn de rûpoşa xwe ya şoreşger diavêje û bi awayekî aşkere vê helwesta xwe berdewam dike.

Di heyama qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê de reformîzma hemdem, vê hişmendiya rêxistinê ya menşevîzmê derdixe pêş. Ev hişmendiya rêxistinbûnê, bi hişmendiya şewaza xebatê û şoreşê ya reformîzma hemdem re di navahevsengiyê de ye.

Weke ku tê dîtîn nêrîna hevalê Mîhrî Bellî, di encama teoriya şoreşê ya rastgir û şewaza xebatê ya rastgir de, nêrîneke rastgir e. Rêxistina ku ji hêla kesên wiha ve tê avakirin wê bibe TÎP'a nû ya ku stratejiya wê şoreşa demokratîk a neteweyî ye. (5)

Em li dijî hemû rêxistinbûnên dij-lenînîst in. Em ne alîgirên rêxistina pergale ne, em alîgirên rêxistina şer in. Partiyê ku dikare bibe rêxistina şer, li ser bingeha hêmanên lenînîzmê û li gorî rêxistinbûna lenînîst ava dibe.

Cudahiyên bîrdoziyê yên di navbera me û hevalê Mîhrî Bellî de li ser van hersê sernivîsan e. weke ku tê dîtîn, perspektîfên me ji hev cuda ne. Ev cudahiya perspektîfê, xwe di çend mijaran de dide der. Di demên dawî de di nîqaşên derbarê neteweperestî, mijara neteweyî û revîzyonîzmê de nêrîn û perspektîfên rastgir ên hevalê Mîhrî Bellî bêtir diyar bûn.

Em bi kurtasî behsa van mijaran jî bikin.

Li gorî hevalê Mîhrî Bellî, îro di nava tevgera çîna karkeran de xeta reformîzma civakî, revîzyonîzm û revîzyonîzma hemdem tune ne. Revîzyonîzm, bi Bernstein derketiye holê û bi mirina wî re ew jî wînda bûye. Tişteki çewt e ku mirov bêje li hin

welatên sosyalîst ên cîhanê revîzyonîzm serdest e yan jî rêveber e. Ji ber ku ravekirina revîzyonîzmê aşkere ye; revîzyonîzm, nepejirandina aşkere ya marksîzmê ye.

Ev nêrîn ji bingeha xwe ve şaş e. Revîzyonîzm, ne nepejirandina aşkere ya marksîzmê ye. Berovajî vê yekê revîzyonîzm, nepejirandina hin dozîneyên marksîzmê ya veşartî ye. Wateya wê ya ferhengê sererastkirin, kontrolkirin e. revîzyonîzm, li gotinên marksîzmê xwedî derdikeve, lê belê cewher û bingeha wê napejirîne. Hevalê Mîhrî Bellî ji ber nêrînen xwe yê reformîzma civakî yê di derbarê şoreşê, şewazê xebatê û rêxistinbûnê de, revîzyonîzmê bi vî awayî pênase dike û dibêje ku îro revîzyonîzm tune ye. Lê belê hişmendiya rêxistinê, teoriya şoreşê û şewaza xebatê ya Mîhrî Bellî, weke nûnerên tevgera revîzyonîst in. Mîhrî Bellî ji ber ku van nêrînan weke nêrînen şoreşger dibîne, xwediyên van nêrînan jî weke revîzyonîst nabîne û bi vî awayî gelekî asayî ye ku di nava tevgera çîna karkeran de napejirîne ku tevgera reformîst a civakî heye.

Em werin mijara neteweperestiyê...

Li gorî hevalê Mîhrî Bellî di navbera “neteweperestiya şoreşger” û enternasyonalîzma proleter de nakokî tune ne. Mîhrî Bellî’yê ku xwe weke “neteweperestekî şoreşger” pênase dike, dibêje ku kesên sosyalîst, neteweperestên tund in. Lewra “kêmasiya neteweperestiyê, mirovan dûrî enternasyonalîzmê dibin”.

Gelo Mîhrî Bellî nizane ku kesên sosyalîst ne neteweperest in, lê belê welatparêz in û têgehên nasyonalîzm û enternasyonalîzm, bi giştî li dijî hev in? Bêguman dizane. Lê belê helwesta Mîhrî Bellî xwe bi tundiya bûrjûwaziya biçûk ve girê dide û ev helwest dike ku dûrî şoreşgeriya proleteriyayê bikeve û qaşo “neteweperestiya proleter” pêş dixê.

Di bingeha van tevan de ew tişt heye ku bûrjûwaziya biçûk a tund a “şoreşgerên neteweperest” xwe wiha nîşan didin ku ew

şoreşgerên neteweperest in û ji şoreşgerên proleter ne cudatir in û bi vî awayî xwe şêrîn nîşan didin. Mihrî Bellî bi heman awayî dixwaze xwe di mijara neteweyî de jî şêrîn nîşan bide.

Li gorî Mihrî Bellî di mijara pirsgerêka neteweyî de hertim û di nava her mercî de li Tirkîyeyê tenê riyeke çareseriyê heye; tenê riyek heye ku li gorî berjewendiyên gelê kedkar ê Kurd e. Ew jî çareserîya di nava sînorên Misakî Millî de ye.

Lê belê ev nêrîn ji bingeha xwe ve şaş e û li dijî sosyalîzmê ye. Weke ku tê zanîn proleteriyaya şoreşger, di çarçoveya mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya neteweyan de nêzîkî mijara neteweyî dibe. Em, li gorî mafê diyarkirina çarenûsa xwe neteweyan dibêjin ku gotinên weke “di nava her mercî de pêwîst e ku mijar di nava sînorên Misakî Millî de were nirxandin” an jî “yekane rîya li gorî berjewendiyên gelê Kurd ê kedkar, bikaranîna mafê veqetandinê ye” şaş in. Hêmanên neteweperest ên bûrjûwaziya biçûk ên herdu aliyên, van nêrînan tînin ziman. Bi awayekî aşkere tê diyarkirin ku mafê diyarkirina çarenûsa xwe ya neteweyan di nava kîjan mercan de weke *veqetandin*, *xweserî û federasyon* dikare were bikaranîn. (Em ê vê mijarê di nivîseke din de bi awayekî berfireh binirxînin. Ji ber ku armanca vê nameya kurt ne ev e, em li vir mijarê berfireh nakin).

Weke ku me li jor jî diyar kiriye, di bingeha van nêrînan neteweperest ên Mihrî Bellî yên ku enternasyonalîzma proleteriyayê lawaz dike de hişmendiya şoreşê û şewaza xebatê heye; lewra xwe bi “şoreşgerên neteweperest” ango bi şoreşgerên bûrjûwaziya biçûk ve girê didin û xwe ji wan re dadixin.

-V-

Me cudahiyên nêrînê yên di navbera me û Mihrî Bellî de bi kurtasî wiha diyar kirin. Weke ku tê dîtin mijar ne mijara helwestekê li dijî “cudahiyên biçûk ên nêrînê” ye ku di nava refên me de mijareke di asta duyemîn de girîng e; mijar

neqandina di navbera lenînîzm û reformîzma civakî de ye.

Ev, ne bi riya rexneyê sererastkirina nêrînên şaş e; mijar, mijara bêbandorkirina nêrînên rastgir ên ku dikarin tevgerê ji bingeha xwe ve ji rê derxin e.

Helwest, di navbera şoreşgeriyê û oportunîzmê de ye. Kesên ku dibêjin nêrînên Mihrî Bellî şaşin, lê belê bi hincetên cuda di nava wan refan de dimînin, bila zanibin ku di nava çirava oportunîzmê de mane. Û niyeta wan a subjektîf çidibe bila bibe, hestên wan çiqas paqij bin jî di nava helwesteke herî qurnaz, durû û gemar a oportunîzmê de ne.

Em ê heta dawiyê li dijî wê yekê derkevin ku hêmanên şoreşger ên proleteriyayê bibin mijara bazarê. Em heta niha nêzîkî bazarên wiha nebûne û em ê îro jî nêzîkî wan nebin!

Bila neyê jibîrkirin ku şoreşgerên proleter, tenê ji bo aramiya tevgera şoreşger dikarin di taktîkan de yan jî di mijarên teorîk de dikarin lihevkerinên derbasdar ava bikin û ji bo şoreşê xwe biguherînin. Lê belê di hêmanên şoreşger ên proleteriyayê de tu carî nêzîkî bazaran nabin. Û li dijî kesên ku van hêmanan dikin mijara bazarê jî helwesta herî nelihevker û tund nîşan didin.

Ew hevalên ku me bi tundiyê tawanbar dikin pêwîst e ku dev ji van helwestên xwe yê şaş û lihevker berdin; pêwîst e ku hevalê Mihrî Bellî rexnedayîna xwe dike û were ser riya rast; pêwîst e ku ev heval pragmatîzmê deynin aliyekî, ji hêmanên sosyalîzma zanistiyê bawer bin, beriya ku dema wê derbas bibe hişê xwe bînin serê xwe. Em bi dostanî û hevaltîyê van şîretan dikin.

KURTULUŞ

RÊBENDANA 1971'Ê

JÊRENOT:

(*) Ev nivîs bi înzeya Ertugrul Kurkçu, Yusuf Kupeli, Munir

Aktolga û Mahir Çayan di Rêbendana 1971'ê de ji WEŞANÊN KURTULUŞ'ê weke borşûrekê hate weşandin.

(1) Me dikarîbû em dev ji ASD'yê bernedin. Me dikarîbû em pêşiya bîrdozî û komên din bigirin. Lê ji ber nivîskarên sereke yên ASD'yê di vê kovar de nûnertiya bîrdoziya duyemîn tê kirin. Li gorî me ASD, weke kovara Turk Solu'yê dema xwe derbas kiriye. Ji ber vê yekê jî me ASD ji koma din re hişt.

(2) "Maoist"ên Campus ên Amerîkayê û koma PDA'yê ya welatê me, mînakên herî şênber ên v^eyekê ne. Rewşa vê beşa sosyalîzmê ya li welatê me bi rastî jî kambax e. (Kesên li dora PDA'yê asta geşedana welatê me, taybetmendiya herêmî, rewşa erdnîgariyê û taybetmendiya heyama qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê paşguh dikin û drûşm û taktîkên şerê Gel ê Çînê bêyî ku bala xwe bidin mercên cih û demê radigihînin û bi vî awayî armanc û bergehê berovajî dikin. Em ê van xalan di nivîsa xwe ya bi navê Riya Li Gorî Tirkiyeyê de rave bikin. Armanca vê nivîsa kurt ne ev e.) Kesên wiha ji aliyekî ve li salonên xweş û li Campus'an şerê gel diqîrin û li aliyê din jî çavan didin çînên serdest û ji bo tevgera şoreşger dibêjin ku ew anarşîst (!) in ku dixwazin tevgerê derxin derveyî sînorên makezagona 27'ê Gulanê.

(3) Weke ku hinek dibêjin, bûyîna hêza pêşeng a proleteriyayê nayê wê wateyê ku proleterya di nava hêzên sereke de cih nagire. Karker û gundî, hêzên sereke yên şoreşê ne.

(4) Wê şoreş ji gundewaran berê xwe bide bajaran. Ev, dozîneya gerdûnî ye ku lenînîzm wê ji bo welatên mêtîngeh û nîv-mêtîngeh derpêş dike. Ji ber ku Tirkiye jî welatekî nîv-mêtîngeh e, wê şoreşa Tirkiyeyê jî vê riyê bişopîne. Ango wê şerê sereke li gundewaran be. Lê belê ji ber taybetmendiya heyama qeyrana 3'yemîn a emperyalîzmê û asta geşedanê ya hêzên hilberîner ên Tirkiyeyê wê şoreşa Tirkiyeyê ne weke şoreşên Vîetnam, Çîn û Kubayê bigihêje serkeftinê. Wê têkilîyên bajar û gundewaran û merhaleyên şerê gel li Tirkiyeyê cuda bin. Di heyama pêşîn de wê bajar qada sereke bin û gundewar alîkar bin

û wê di heyama duyemîn de gundewar sereke bin û bajar alîkar bin. “Şerê Şoreşgerî yê Hevgirtî”. (Em ê van mijaran di nivîsa xwe ya Riya Li Gorî Tikriyeyê de rave bikin).

(5) Mirov ji têgihîştina rêxistinê ya hevalê Mihrî Bellî re bêje menşevîzm jî, zêde ye. Mihrî Bellî ji bo ku xwe ji tundrewên bûrjûwaziya biçûk re şêrîn bike dibêje “têkoşîna ji bo demokrasîyê, têkoşîna ji bo rêxistinê ye. Rêxistin, bi saya têkoşîna demokrasîyê dikare ji vê pêvajoyê rizgar bibe” û bi vî awayî mijara partiya sosyalîst, dixê nava zehmetiyê.

Wergera Ji zimanê Tirkî: Aram Alî